# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (316):

## Şert û mercên dawîkirina Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyan û saxlemiya herêmê, dijayetiya li ser du temenmezinên Kurd, veşartina zorane û girtinine bêsûcane, geregoşî û dizîn

Rewşa geregoşiyê li herêmê berdewam e, nemaze binpêkirinên milîseyan bi riya nivîsgehên wan ên abortî û ewlekariyê, û ew dizînên ji mal û dîkanan û herweha makînan û pêz her derin fere dikin û vêre jî dijîtiya li ser xwediyan, û ligel wê jî talankirina kelûpelên malan û vekirina derî û pencerên mal û dîkanan ji aliyê yên dest danîne ser ve, li dema çûna wan bo herêmên xwe yên resen; Û hîn siyaseta ewlehiyê ya ku "Amûra Ewlekariya Giştî" (ya Destlatên Şamê) dê di derbarê herêmê û xelkê wê de bimeşîne ne diyar e. Piştî ku destê xwe hêdî - hêdî danî ser doseya ewlehiyê û derçûna biryara helandina milîseyan, û "Asayêşa Leşkerî Û sivîlî" yên girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê jî di nav de, vêca guhertina cilên endamên wan û nîşanên makînên wan bes nake, û qewtandina hemî serkêşên wan û piraniya endamên wan (ên sûcdar di gendeliyê û pêkanîna binpêkirin û tewanan de) pêdivî ye, mîna: "**Ehmed Cemal Kebso**" yê ji Bajaroka Tilrif'etê - Gundewarê Heleb a Bakur, berpirsiyarê şaxa serekîn a Asayêşa Leşkerî li Bajarê Efrînê, û yê bi gendelî û zordestiya xwe navdar.

**Bidawîkirina Dagîrkeriya Turkiyê û milîseyan li herêmê, û kar li ser saxlembûna herêmê, bi şêwakî destpêkî di vê astedemê de ev pêdivî gerek in:**

- Vekişandina Artêşa Turkiyê ta sînorê xwe yê navdewletî yê naskirî, girtina nivîsxaneyên Istîxbaratên Turkiyê, baykotkirina lîsteyên kesên bi sedemên siyasî tewanbarkirî û daxwazkirî, û nekaranîna wan lîsteyan ji bo girtina hemwelatiyan û herweha baykotkirina lêgerîna li wan li ser rêbendan, û bidawîkirina dezgeh û saziyên Turkiyê li hemî warên dewlet û civakê.

- Jiholêrakirina biryargehên leşkerî ji ciyên bi nişte, helandina milîseyan bi awakî rasteqîn, û girtina hemî nivîsgeh û biryargeh û rêbendên wan ên leşkerî, û derkirina serkêşên wan û piraniya endamên wan ên di gendelî û pêkanîna binpêkirin û tewanan de gunehkar; Û belavkirina yekîneyine ji Artêşa Sûriyê ya nû ji bo parastina sînor bi Turkiyê re.

- Jihevkirina girêdana Herêma Çiyayê Kurmênc/Efrînê bi Wîlayeta "Hetayê" ya Turkî ve, vegerandina girêdana wê bi rengekî fermî û aşkere bi Parêzgeha Heleb re, û qedexekirina bi karanîna navê "Herêma Şaxa Zeytûnê" ji ber ku ew nav ji navê piroseyeke leşkerî ye Turkî ye dijberî li ser beşekî ji Sûriyê -wek welat û gel-hatiye.

- Rêdana bikaranîna pereyên/lîreyên Sûrî û hevojtina wê, vegerandina toreyên hevgîhandinên şirîtî û neşrîtî/hewayî yên Sûrî li herêmê, û girêdana hemî dezgehên rêvebirî û xizmetguzarî bi Parêzgeha Heleb ve.

- Sipîkirina hepsên aşkere û bidizî li herêmê ji hemî girtiyên bi tewanbariyên siyasî hatine girtin, û serbestberdana bi sedan girtî û yên zorane hatine hindakirin ji xelkê herêmê, yên di hepsên "Hewar Kilis û Çobanbegê/El'ra'î" û hin din de, li Herêmên "Ezazê û Babê û Cerablusê", ji nav wan jî hinik ji dora heft salan ve veşartî.

- Desteserkirina Amûra "Ewlekariya Giştî" bi endam û berpirsiyarine nû li ser doseya ewlehiyê û peydakirina aramiyê, li ser bingeha parastina mafên mirovan û azadiyên giştî û pêkanîna dadmendiyê, sekinandina girtinên bêsûcane û îşkencekirinê di hepsan û navendên ewlehiyê de, parastina malmewdanên giştî û taybet, û danîna rêgirekê ji hemî binpêkirin û destdirêjiyan li ser, û vegerandina mafan ji xwediyan re, bê tu şert û mercan an jî ferzkirina vêrgiyan.

- Rawestandina destdirêjî û dijayetiyan li ser jîngehê û nixumandina geyayî, jê qutkirin û şewitandina daristanan û darên biber, û sekinandina dizîna kevneşop û peykerên dîrokî.

- Parastina Bendava "Meydankê" û rêvebirina pirojeyên avdanê û ava vexwarinê bi rengê ku pêdiviyên herêmê werin peydakirin, û sekinandina dizîna ava wê ya ku bo Bendava "Rihaniyê" ya Turkî tê şandin.

- Peydakirina jîngeheke aram bo vegereke jixweber û azad û bi rûmet ji hemî yên ji herêmê hatine koçberkirin re, û daxwaz ji anîndeyên hatine herêmê ku vegerin herêmên xwe yên resen.

- Jiholêrakirina hemî têkar û sedem û encamên guhertina demigrafî ya ku Dagîrkeriya Turkiyê çêkiriye, û taybetî di binyata niştecîbûnê ya herêmê de.

- Jiholêrakirina dîwarên çementiyî yên ku li hundir Bajarê Efrînê û bajarok û gundên wê de avakirî, bi behaneya parastina biryargehên Turkiyê, û hilanîna destlata Artêşa Turkiyê ji ser gundên ku xelkê wan bi tevahî koçberkirî ji Avdara 2018an. Z ve, û rêdana vegera xelkê wan gundan, û ew gund jî ev in: ("Cilbir, Gubelê, Dêrmişmişê, Zirêkatê, Basilê, Xalta" - Robariya/Çiyayê Lêlûn, "Çê, Dêrwîş" - Navça Reco).

- Peydakirina gihîştina alîkariyên mirovî û piştgiriya şaredariyan da ku kanibin bi erk û stubariyên xwe rabin, çaksazkirina binevahiyan û avahiyên giştî, û girêdana beşê perwerdekarî û hînkariyê bi saziyên dewletê re, bi mercê gerantîkirina belvakirin û hînkirina ziman û çanda Kurdî di hemî astên xwendinê de.

- Bidawîkirina hemî rengên bindestkirina netewî di dermafê Kurdan de, û hemî rûdanên tetrîkirin an te'irîbkirina zorane û rengên tundrewî û bindestiya olî, û jiholêrakirina cudawaziyê di dermafê Kurdên Êzdî de, û gerantîkirina azadiyên olî ji hemî hemwelatiyan re.


**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Dijayetiya li ser du temenmezinan:**

- Li nîvê şeva 13.02.2025an. Z, piştî ku wan elektirîk qut kirin, du çekdarên serçavgirtî mala temenmezin "**Mihemed Henîf Ehmed Hemzo** /67/sal" li Gundê "Endarê" - Şêrewa basmîş kir, û dijayetiya wî û hevjîna wî - yên seqet- kirin û bi boriyê li wan dan, kêrek mezin kişandin wan û mal serbinqotî hev kirin, tibabine diravî (/300/Dolar Emrîkî, /1660/Lîre Turkî) û amûreke xilyewî jê dizîn, û ta nimêja berbangî bi îşkencekirina herdu hevjînan xwe tesele kirin, ta ku li derketinê ji xelkê re were xuyan ku derin mizgeftê û ne diz in.




- Li êvara 14.02.2025an. Z, du çekdarên serûgirtî mala temenmezin "**Hemîd Bekir Hebeş Kenco** /67/sal" li Bajaroka "Be'idîna" - Navça Reco basmîş kir, li dema nebûna hevjîn û kurê wî ji malê, dabençe/damençe kişandinê û lê xistin û gefdana kuştinê lê kirin, û tibabeke diravî /10/hezar Dolar Emrîkî ji oda kurê wî û /300/Dolar jî ji oda hevjîna wî dizîn, û paşê jî revîn. Û bi ser ku yê dijatî li ser hatiye kirin çekdarek tewanbar kir, lê dîsa jî "Usame Rehal/Ebo Hesen Obame" -cîgirê serkêşê Milîseya "Lîwa'i 112" ya ku bajarokê desteser dike- red kir ku wî bigire û lêkolînê vê re bike, û bi ser de jî rabû li bajarokê geriya û li deriyên maline kurdan da, bi behaneya ku herdu diz revîne wan malan, weke şanoyeke lawaz da ku li ser wan veşêre.



**= Veşartina zorane:**

Di raporeke wênekirî û li 15.02.2025an. Z hatiye belavkirin de, **Ajansa "El'Forat"** ya nûçeyan a girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê açiq kir, ku "**Ehmed Cemal Kebso**" -serkêşê Milîseya "Asayêşa Leşkerî - Şaxa Efrînê"- Hemwelatî "**Ednan Îso Îso** /35/sal" ji xelkê Gundê "Dargirê" - N. Mabeta serbest kir, da ku keça xwe "Cîlan" a di Nexweşxana Sûrî ya pisporî li Bajarê Efrînê de raketî û tê dermankirin bibîne, ya ku ji berî sê rojan li Gundê "Maratê" wendakirin, piştî derketina diya wê ji mal ji bo anîna hinek êzing, û ew jî di xew de bû.

Û li gorî gotina hevjîna wî "**Zêneb Şêx Sadêq**" û jêdereke xwecihî, "Ednan Îso" ji berî şeş heyvan bi tuhmeta têkildariyê bi Rêvebiriya Xweser a berê (RX)re hate girtin, bi ser ku wî ji Avdara 2018an. Z ve -jerkî herêm hatiye dagîrkirin- ew bernedaye, dîsa jî "Asayêşa leşkerî" di hepseke xwe ye taybet de zorane veşartî hîşt, bê têkildarî bi cîhana derve re yan jî pêşkêşkirina wî bo dadgeheke dadmend; Û ew malbata belengaz bi çetiniyên jiyanê yên têvel û xwestinên virdewêde re rast hat.




**= Girtinine bêsûcane:**

Li gorî jêdereke xwecihî, li navboriya hefta yekê ji vê heyvê, dadgeha Efrînê ya girêdayî Dagîrkeriya Turkiyê bêtirî **/45/ hemwelatiyên Kurd** -piştî ferzkirina baceyeke diravî /500-600/Dolar Emrîkî li ser her yekî ji wan- serbest berdan; Ew li navboriya du heyvên dawiyê ji aliyê Milîseya "Asayêşa Leşkerî" ve hatibûn girtin û bo Hepsa "Maratê" ya navendî hatibûn birin, bi tewanbariya têkildariyê bi (RX)a berê re; û Weha jî:

- Li navîna Berfenbarê/Berçile 2024an. Z, Rêbenda "El'şet - Çateriya Ezazê ya Rojava" ya Milîseya "Asayêşa Leşkerî" temenmezin "**Umer Şêx Qenber**" û kurê wî "**Ehmed** /23/sal" ji xelkê Gundê "Xilalka" - Navça Bilbilê girtin, li ser riya vegera wan ji aliyê penaberiyê bi tewanbariyin/tuhmetin çêkirî, û piştî heftakê û dandina hezar Dolar Emrîkî yê yekê serbest kir, û yê dudiyê jî piştî bîst rojan ji girtinê û dandina/4/hezar Dolar.

**= Dizîn:**

**- Li Bajaroka Be'idîna:**

Li rex dizînin berê û piroseya dizîna çekdarane ya li jor hatiye zimên, du çekdarên serçavgirtî sê berx ji odak kargeheke betariyan e Hemwelatî "**Ebdîn Mihemed Mistefa/Malbata Alo**" û ya li derbasgeha bajarokê dizîn, bi ser ku parêzvanekî wê jî heye; Û çekdarin din derxistokeke avê/xetasek ji bîreke irtiwazî ye Hemwelatî "**Beşar Mihemed Şe'iban**" dizî, hin din betariyek ji tirektoreke çandiniyê ye "**Selah Mihemed Midewer**" dizî, hin din (sê teneke zêtê zeytûna/her yek 16 KG sade, amûreke Invênter a taqeta elektirîkroniyê û tibabeke diravî) ji mala Temenmezin "**Reşîd Hesen Dehdo**" dizîn, hin din jî amûreke xilyewî ji Temenmezin "**Mezyet Mistefa**" dizî, û hin din jî di dizîna herdu malên cîran "**Ehmed Reşkêlo**" û "**Mihemed Hesenîk**" de bi ser neketin.

Bi ser pirbûna dizînê li Bajarokê di navboriya herdu heyvên dawîn de, û hebûna kamîreyê çavdêrîkirinê, biryargehek Milîseya "Asayêşa Sivîl", û rêbend û biryargehên Milîseya "Lîwa'i 112", ta niha dizek bi tenê jî nehatiye girtin, di heman dema ku ew ji bo lêkolîna bi hemwelatiyekî vedigere bajaroka xwe û girtina wî/wê de jî pir şiyar e, û malbatek ji anîndeyan jî rastî dizînê nehatiye.

**-** Li Bajarê Cindirêsê 07.02.2025an. Z, çekdarina tibabeke diravî /500/Dolar Emrîkî ji mala Hemwelatî "**Rehîm Silêman Lutfî**" dizî, hin din tiştmiştên xwarinvexwarinê ji dîkana "**Ehmed Mihemed Mihemed**/bi **Çavreş** tê nasîn" û makîna cîranê wî dizîn, û hin din jî di dizîna Mala "**Mistefa Deyan**" de bi ser neketin.

**-** Li Gundê "Kurzêlê" - Navça Şêrewa, li 09.02.2025an. Z, çekdarina /8/mî ji mala Hemwelatî "**Mihemed Ezîz Îbo**" dizîn; Û li şeva 15.02.2025an. Z, çekdar in derbas avahiya Hemwelatî "**Ebid El'rehman Îbo**" bûn, ji bo dizîna tirektor û matorekê û tiştine din, lê giropeke ji hemwelatiyên ku gund diparastin tevî dehên din avahî dorpêç kir, û berpirsiyarekî gund ji Milîseyên "Tîpa/Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" rabûn ew girseya xelkê ji hev bela kir û diz parastin û derxistin; Û ji berî heftakê ji heman avahiyê keblên elektirîkê û amûreke invêntereke çandiniyê hatin dizîn.

Herweha jî malbateke ji Gundewarê Humsê û dest daniye ser mala "**Welîd Ezîz Îbo**" yê zorane koçberbûyî, hemî heyînên hundir malê û derî û pencereyên wê tevî derxistokeke avê/xetas û dûmahîkên wê dizîn, bi ser ku keça "Welîd" a li gund red kir, lê sixêf jêre hatin kirin û gef danê, û Kurd bi "Berazan/Xenzîran" hatin salixkirin.

**-** Li Gundê "Hesendêra" - N. Bilbilê, li 12.02.2025an. Z, çekdarekî matoreke duloqî ye Hemwelatî "Ehmed Ebdo" dizî.

**-** Li G. "Şêxkêlê" - N. Mabeta, ji berî dora deh rojan, çekdarina /20/mî yên Hemwelatî "**Mûse Welîd**" dizîn, û hin din jî makînak pîkab dizî.

Û li G. "Gobekê" yê hevcîwar jî, çekdarin din derxistokeke avê/medexak û cilin/kincin ji mala Temenmezin "**Qadêr Henan**" dizîn.

**= Li Gundê "Bircqasê" - Navça Şêrewa:**

Milîseyên Hêza Hevbeş (El'emşat, El'hemzat) li destpêka Berfenbarê 2024an. Z dîzînin fere kirin, jê: çar makîne pîkab ên "**Umer Mihemed Elî, Hesen Elî, Hesen Elî Mamo, Mihemed Elî**" û pez û dewar in (/40/mî yên "**Necîb Elî Mamo**", /12/mî yên "**Zûhêr Erebo**", /60/mî yên "**Edhem Ehmed**", /3/çêl ên "**Nadêr Mihemed Elî**", /6/çêl ên "**Nebî Rehmo**"), û hemî tiştmiştên hundir Malên ("**Cemîl Menan**" tevî giropeke zayenda elektirîkê, "**Nebî Rehmo**" û teksiya wî, "**Nadêr Mihemed Elî**" digel giropa taqeta royê). Û li dema topebarankirina gund /6/mal bi piçekî hatin roxandin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

Li vê dawiyê, giropeke gerok ji Amûra "Ewlekariya Giştî" rabû "**Ebo Ye'irub**" -serkêşekî milîseyan li Bajarê Cindirêsê girt, ji ber ku wî du "makîne cîp" ên nû û yên berpirsiyarên rijîma berê ji şamê dizîbûn, û li ba xwe veşartibûn, û herweha jî wî hemwelatiyekî ji xelkê Heleb revandibû û li cindirêsê veşartibû bi mebesta ferzkirina vêrgiyeke diravî li ser beramberî berdana wî.

**Li hember rewşeke weha ne baş de, astengiyên mezin pêşberî Destlatên Sûrî yên nû dibin, û ew li pêş ezmûna ku wê çiqas kanibin pêngavine piraktîkî di warên me li jor anîne zimên de bavêjin, li gor rêbaziyeke niştîmanî û Demokratî, û em serkeftinê jê re dixwazin.**

15.02.2025. Z – 2636. K

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Temenmezinê birîndar "Mihemed Henîf Ehmed Hemzo" û pêlîzkandina bi mala wî li Gundên "Mihemed Henîf Ehmed Hemzo", 13.02.2025. Z.
- Temenmezin "Hemîd Bekir Hebeş Kenco".
- Hemwelatî "Ednan Îso Îso" tevî hevjîn û zaroka wî di nexwaşxanê de li Bajarê Efrînê, jêder: Perçevîdiyok a Ajansa "El'Forat" li 15.02.2025an. Z.